
Helbest
REŞBELEK
A.R.T DILAZAD
Corduene Adar 2023

# REŞBELEK

A.R.T DILAZAD

Mêrdîn

Corduene / 21 ADAR- 2023

Dengvedana Derengmayî
A.R.T DILAZAD
Zaningeh: 70

Berpirsyarê Giştî
A.R.T Dilazad

Editor
Ridwan Xelîl

Şewirmend
Zehra Dilşa, Nûbihar Rana,

Pisporê Zanistî
Azra Zelal, Muhammed Ronî

Berg
A.R.T Dilazad

Serrastkirin
Rony Rody Roda

Çapa Dîjîtal
Corduene – Adar - 2023

Bo Pêwendî, Pêşniyaz, Rexne û Alîkirinên We:
Tel: 0 505 235 53 24
Web: www.zaningeh.net
E-mail: dilazadart@gmail.com

Hemû mafên pirtûkê ji aliyê nivîskar û weşanxaneyê ve hatine parastin.

# JIYANNAMEYA DILAZAD A.R.T.

Berpirsyarê Giştî ê Zanîngeh Akademî

Li ser çand û hûner û wejeyê dixebitê. Nivîs û helbest û lêkolînen nivîskar di kovarên Kurdî de hatine weşandin. Wek dî lêkolînên nivîskar di gelek malperên înternetê te hatine weşandin. Bi zimanê zikmakî re (Kurdî) zimanê Tirkî û hinekî Îngilîzî jî dizanê.

**Berhemên Kurdî**

1- Destana Evînê, 2010
2- Ramanên Azad, 2010
3- Tûrik, 2011
4- Winda, 2012
5- Lêkolînên Kurdî I, 2013
6- Lêkolînên Kurdî II, 2013
7- Tûrikê Çîrokan, 2015
8- Çanda Xwarinê, 2016
9- Lêkolînên Kurdî III, 2017
10- Helbestên Binbêjingê, 2017
11- Bexçê Çîrokan, 2017
12- Çîrokên Şevên Direj, 2017
13- Demsala Pirpirînkên Azadiyê, 2017
14- Sînemaya Cîhanê, 2017
15- Sînemaya Kurdî, 2017

16- Kaos 2.0, 2018
17- Destpêk û Dîroka Sînemayê, 2018
18- Kurdîpedîa, 2019
19- Lêkolînên Folklorê I, 2019
20- Lêkolînên Folklorê II, 2019
21- Lêkolînên Folklorê III, 2020
22- Tenê Guhdariya Bêdengiyê Dikim, 2020
23- Dengvedana Derengmayî, 2021
24- Destpêk û Dîroka Sînemaya Kurdî, 2022
25- Reşbelek, 2023

**Berhemên Ku Wergerandine Kurdî**

1- Rîsala Aborîye, 2010
2- Wateyên 12 Suretên Qur'an a Pîroz, 2011

Ev pirtûk diyariye ji bo;

Ronî, Nûbihar, Dilşa, Zelal, Nûpelda

û

Ew kesên ku reşbelekên jiyana xwe bi azadî û serkeftinê dixemilînin re ye.

Bi taybetî ji Bavê min Xelîlê Hecî Alîye Helê

# NAVEROK


JIYANNAMEYA DILAZAD A.R.T. .................................................4

NAVEROK ..................................................................7

PÊŞGOTIN .................................................................9

REŞBELEK ................................................................13

RÊYA EHLÊ HEQÎQAT Ê ......................................................17

GULDESTEYEK ..............................................................22

QESÎDEYA EVÎNÊ ...........................................................27

SÎNG Û BERÊ YARA GERDEN ZÊRÎN ............................................31

QESÎDEYA BIHÛŞTÊ .........................................................35

DENGVEDANA DERENGMAYÎ ......................................................39

TENÊ GUHDARIYA BÊDENGIYÊ DIKIM ...........................................44

EY XWEDA ..................................................................47

TERTOQÎ ...................................................................50

ÇÎROKEK NEJIBÎRBÛYÎ .......................................................54

HINGIV BI EVÎN DIBE KANIYA ŞÊRÎN ....................................56
BES E EV XEWNÊN TARÎ........................................................57
BERÎVANA MIN ......................................................................58
BEJN Û BALA TE ....................................................................59
FELSEFEYA KÛR......................................................................60
KEVOK.....................................................................................61
KU EZ VEGERIM YÊ ÇI BIGUHERÊ?.........................................62
EY SAQÎ TU DAGIR QADEHA MIN ..........................................63
DEMSALA PIRPIRÎNKÊN AZADIYÊ...........................................74
DU ÇEM BÛN YEK... ...............................................................76

# PÊŞGOTIN

Helbestvan; deng e... Dengekî ku ji dil derdikeve û bi nivîsandinê bi beden dibe. Dengekî ku xewê li zaliman diherimîne... Evîndar e... Evîndarekî ku ji bo dildara/e xwe çi bibêjê kêm dibeje...

Helbest; hest û ramanên bêdeng û bêziman e. Hawar û qîrîna bindestan û mezlûman, dev û destên bendkiriyan, evîndaran û dildaran e... serhildana li hember her curê zilm û zordariyê ye. Evîn e... evîneke bêderman e... ku dermanê wê di nav derdê wê de veşartî ye...

Armanca nivîsandina helbestê; bi awayekî kin û watedar nivîsandina raman û gotinên dirêj e. Helbest navgîneke ji bo ku peyam û hûnera nivîskar bê xuyakirin. Helbest diyarkirana raz û raman û hesta ye. Helbest mîna dûrbînê dûrahiyê nêzîk dike. Ji bo dîtinê tenê çav na, hiş û dil jî pêwîst in...

Yekavakirina ziman destpêkirina kuştina ziman e. Ku ziman bû yekava dewlemendiya xwe winda dike. Wate û kûrahiya bêjeyan bi yekavakirina ziman re qels dibe û roj bi roj dikeve bin bandora zimanê serdest.

Zimanê civakê li gor olê/dînê civakê tê xemilandin. Bêje û gotinên dînî zimanê civakê dewlemendtir dike. Tu civak di sirûşta xwe de bêdîn nabe. Her çiqas saziyên hemdem bi zagona dewletên xwe bêdîn nişan bidin jî gel di nava xwe de bi navê kevneşopî û toreya dînê xwe dide jiyandin.

Netew bi tore û kevneşopiyên xwe dijîn. Ger neteweke ji kevneşopî û toreya wî dûr bixin ew netew ê roj bi roj di nav pelên dîrokê de winda bibe. Ji ber ku toreya Sumeriyan, Urartiyan, Hitîtiyan, Fenîkiyan û Hûna winda bû ew netew jî winda bûn.

Nivîskar divê berhemên xwe li ser koka torêya xwe ava bike. Lê divê di nav newalên reş ên demên kevin de nemîne. Hunermend li ser bingehên duh roja îro ava dike.

Nivîskar û hunermend divê tenê girêdayê rastî û dadiyê bibin. Lê bele di nivîs û hûnera xwe de dikarê xewn û xeyal û ramanên xwe diyar bike. Ji tu kesî/ê û ji tu sazî re nebe tirî. Berhemên nivîskar û hunermend divê pêşî xwediyê berhemê rast bike. Berhem divê bibe dengê kesê/î ku nizanin xwe bîninn ziman. Helbest her çiqasî xwendevan û guhdaran hestîyar û xemgîn bike jî divê bihêvî û bextewar jî bike.

Civak divê li nivîskar û hûnermendên xwe xwedî derkevê. Ji bo ku nivîskar û hunermend mejî û ramanê gel in. Civak bi xêra wan hêvî û daxwaz û armanc, êş û kamraniyan xwe tîne ziman.

Berhem bi kîjan zimanî bê nivîsandin dibe malê wî zimanî. Divê bingeheke bihêz hebe ku rojekê vegere zimanê xwe yê zikmakî. Canê nivîsê bi kîjan zimanî bê ku rojekê vegeriya eslê xwe yê xwe dê diyarkirin. Lê ji bo ku bingeh zimanê nivîsandinê tê girtin ew berhem dibê malê zimanê ku pê hatiye nivîsandin.

Ziman serbest e, azad e. Bêje, wek ku tê dil tê ziman. Ziman di axaftinê de rêbaza xwe bi awayekî sirûştî ava dike. Dema hin kes an hin sazî rêbaza li ser ziman didin an dixin pergalekê de ew tevger siruştiya ziman birîndar dike û car caran dikuje. Ji bedela zimanekî sirûştî ku zimanê zikmakî ye, zimanekî çêkirî tê meydanê. Bi vî awayî bi hebûna ziman tê leyîzandin û ziman xerab dibe. Êdî ziman dikeve bin bandora hin kesan. Zimanê wan kesan û yê civakê ji hev dûr dibe. Mafê tu kesîy an tu saziyan nîn e ku zimanê civakê li gor zanabûn û berjewendiyên xwe birêbaz bike. Her ziman di sirûşta xwe de paqij û zelal e. Divê rêziman nebe bingeha zimanê civakê. Zimanê ku tê jiyandin bingeha rêzimanê ye. Ne mecbur e ku zimanê tê axaftin li gor rêbazên rêzimanê bibin. Ku cûdatî di navbera zimanê tê axaftin û yê rêzimanê de hebin divê zimanê tê axaftin bingeh bê

pêjirandin. Awarteyên dijî rêzimanê ne kêmasî ye, dewlemendî ye. Mînak zimanê Ingilîzî bêrêbaz e. Di her mijara zimên de awarteyek heye. Lê dîsa jî ev ziman di cîhana îro de ya herî bi bandor e.

Evîn ji bo ku bibe destan divê biasteng û bizahmet bibe. Tu destan ji nav jiyanên ku di qesrên belek de hatine jiyîn derneketine. Êşa cudabûnê, koçberî, tirsa windakirinê, şahiya bidestxistinê, kêfa serkeftinê evîn û evîndaran dike destan...

Bi sedema 43. berhema xwe û 16 salîya nîvîskarîya xwe ya Kurdî, heta îro ew kesên ku alîkarî, moral, destek û hêz dane min ez spasîyên xwe yên taybet ji wan re bire dikim. Kesên malbata min, heval û hogirên min û xwendevanên min yên hêja, spasiyen birûmet ji we re bin. Ew kesên ku ji bo çapkirin, redaktekirin, belavkirin alîkarî dane min, ez spasiyên ji dil û can ji wan re dişyînim.

A.R.T DILAZAD

21 ADAR 2023

# REŞBELEK[1]

Ey saqî, ji kiteba noqteyek im
Ji deryaya dilopek im
Ji qedehê qurtek im
Ji can û bedenê ve pifek im

Ey saqî, ev çend sal in digerim li dost û hevalekî
Min nedît û nasnekir yekî weke te dilpakî
Dinya xayîne, ne bû yar, her bûye bar
Her ku me jê bawer kir ew bû arekî dijwar

Ey saqî, ez muptelayê meyxanê me
Heyranê şeraba ji destê te me
Were saqî, bixwene ji kiteba eşqê
Ji bo dilê min û yarê bikin meşkê

[1] Ev helbest di Kovara Nûbihar hejmara 162yan de hatiye weşandin.

Ey saqî, were derman bike van birîn û derdan
Dilê me wek cama Cem cîla ke bi soravan
Serxweş û talan im li meyxanê xêrîdar im
Tu were bazarê ê can didê bi erzanî ez im

Dema me tîra xwe avêt sedefa yarê
Can û beden bû wek pêt û arê
Kevankêş ser xwe rakir perda şermê
Bi şeraba eşqê gihaşte wê sir ê

Ava ku naherikê dibê genî,
Bedena nagerê dibê laşek mirî
Du dil û mejî, du can û beden,
Ku nebê yek ha sax ha mirî

Min dixwest ji bo te helbestekê binivîsînim
Lê dema min navê te digot her tişt ji bîra min diçû
Min dixwest ji bo te gotinên xweş bibejim
Lê navê te ji tev xweşîyan xweştir bû li ber dilê min

Tev gul û kulilk ji bo te bin
Ronîya roj û heyvê li ser te bin
Ava çem û zozana li ber pîye te bin
Dilazad im dildar û evîndarê te me

Ey şahê çavbirçî, çav bernede xezalê ew ya min e
Gerden ji zêr û zîv, zimrûd û yaqût e, ji bo çavê min e
Sîng tev çem û kanî, newal û zozan e, ji bo dilê min e
Lêv şekir û hingiv, şerab û şîr e, ji bo lêvê min e.

Ey kesê li ber dergeyê mîran, li ber te av û emê te
Kurtan ji te kêm e, biqasî kerekî nîne qîmetê te
Li qesrê li pey quna mîr digerê mîna koleya
Dema mîr hestûyan nîşan didê ewt ewta te ye.

Ey Dilo, te xwe gelekî êşand bi kul û derdê xelkê, bes e
Ji derba van nezan û sofî û melayan por spî bû, bes e
Ji bo aramî û dilşabûnê tasek ji şeraba saqî ji bo te bes e
Dilê te wek kanî ber biherikê, dema dil safî û zelal bû,
bes e

15.04.2022 Corduene

# RÊYA EHLÊ HEQÎQAT Ê

Ey saqî, qedehek ji şerbeta ehsenûl taqwîm bide
Ey Pîrê meyxanê tu şerh û delîla şerabê bide
Ev tîra ku çerxa felekê li dil daye, xwînê dibarê
Dîdara rûye dilber ji bo me jara wek hezar emre

Pîr, qedehek da min ji şerava sor
Sofî lal, mela kerr, şah kor
Tilopek niqutî ji lêvên yarê
Camî û meyxanê û qesr dane ber arê

Serxweş û dîn im bi şereba qal û bela
Ev sofî û mela li serê me bûn bela
Li me heram dikin sîng û berê dilberan
Wan lêvên sorxwîn ên esmeran

Mela dibê were mizgeftê, sofî dibê were tekê
Dibêjin şerap heram e, tu li meyxanê çi dikê
Ew şeraba ku li we heram e, li me helal e
Ya em vedixwûn xwîna ji lêvên yara delal e

Ey Şêx, mirîd te bêper û bask difirînin
Kerameta te ew sofî û melayê nezanin
Em bi qedehekê dibin wek teyrê baz
Xelata me ye bisk û gerdena yara bi naz

Sofî dibê neçe meyxanê,
Mela dibê nevewxe ji şeravê
Şah dibê were bibe bend e
Tenê Pîr serbest dike lêvan

Min go: "Ey Pîr, her kes dibe herame şerav" ji bo çiye?
Go: "Ya heram, ava tirîye, ya em vedixwîn ava ronîye
Ya di qedeha me de dermanê dila ye
Ê kû tahma we nizanê, di eşqê de diruye"

Ey sofî û mela û şahê zeman
Ji serî heta binî ji we dibarê guneh
Hûn bi qurtekê serxweş dibin
Em piştî sed qurtî nû dibe bismillah
Hûn bi ramusanekê gêj dibin
Em dinav ramusanên yarê de winda dibin
Hûn bi tîrekê dimirin
Em bi derbên sed tîr û xencerê jîn dibin

Şah û sofî û mela bi dev şev û roj digotin Xweda
Le dilê wan ji lat û uza û menat re şabaş dida
Ey şah, tu li ser Hiseyn digirî li meydana Kerbela
Lê bi şûrê Yezîd tu li serê Hiseyn bûye bela

Min tîrek ji xwînê avet ber bi sedefa yara nazênîn
Tîr li hedef ket, ji yara qametelîf hat ax û ox û nalîn
Ey şêx û sofî û mela, tev ilmê we qal û qîl û gazine
Ê me şerav û meyxanê û yar e, ya em lê digerin zîne

Eşqa ehlî şerîat û tarîqat 'kaf' û 'qaf'e, dûr e ji heq
Em ehlî heqîqat in di şerebê de dibînin rêya heq
Tev mal û milkê Skender li ba me wek dirhemek
Kêf û xweşiya me ne li ba siltanek ne jî li ba şêxek

Bi şeraba elest serxweş bûn û me go belê
Wek Helaç dîn û har bûn, li ser ziman tenê belê
Ji me re camî û meyxane yek e, qencî û başî yek
Şerab û eşq, şerîat û heqîqat ji roja elest ve bûne yek

Şêx dibê xwe bi kirasê min bigre da tu herê cenetê
Ey Şêxo, ji kerê keto, kê xistiye destê te mifta cenetê
Cenet ji bo te tenê horî û xwarin û zewka cinsîye
Ber ew ji te re bin, ya em lê digerin eşq bi xwe ye

Dilo, ew şêx û sofî û mela çi zanin tahma lêvan
Şah û geda çi fêmdikin ji şeraba meyxana şevan
Ew dibê Dilo, te ji bo şerab û yarekê îman berdaye
Nizanin ya em vedixwûn ayetul kursî bi xwe ye

12.03.2023

## GULDESTEYEK

Ey mela, nexwendî tu dixwazê bibê efendî
Zanîn bîreke kûre kesî binê wê nedî
Dilo, dev ji Mela berda, duvre rêya heq dî
Her kes li pey ava heyatê lê kesî ew nedî

Çil salî min rezek danî bi nezanî
Li bazarê sal çûn bi erzanî
Dilo, gulîstanek avakir bi zehmetî
Rê nadim ku werê hilweşandin bi hesanî

Ey şêx û mela û sofî û seyda
Hûn dibejin te dev ji dîn berda
Şeraba eşqê vedixwûm rojê pênc cara
Di meyxanê de serxweş dibim car cara

Ji kiteba evînê dixwenim deh carîyan
Bi lêvê yarê vedikim fitariyan
Tewaf dikim sîng û berê yarê
Sedeqe didim canê xwe bi yek carê

Ey Mela, bi şaşik û waza ev tişt naçê serî
Bi vî eqlî bi vî halî tu nabîne yek horî
Rûne li ser qûna xwe neke gazin ji min
Gotinên te ê vala nakê noqteyek li ba min

Ey mela, ya ku tu sal bi sal lê digerê berat e
Ya em her şev dijîn leyletûlqedr e
Te ji bo horîyekê heftê sal temen qedand
Me her şev li ser sîngê horîsifata xwe borand
Ya ku te bi xwendina bîst sala dît
Me her şev bi qedehek ava sor dît

Ber sed milkê tirk û ereb û ecem
Qurbana yek ramusana te bin
Ax û av û zêr û zîvê van
Qurabana sîng û berê te bin

Ey mela, heyfa van bejin zirav û qamet elîfan
Van jînên çavxezal û çavbelakan
Ku diçin dibin yara nezan û hovan
Bi hezaran mêrxas dimenîn li ber dîwaran

Ey mela, çil salî geriyam li meyxanê
Çil salî vexwar ji şeraba eşqê
Rojê çil carî tewaf dikim berê yarê
Tev çû li ber avê

Ey şah, tu şerabê li xwe helal dikê, li me heram neke
Tu bi namusa jina dilîzê, sîngê yarê li me qedexe neke
Ser ta piyê te dinav guneha de ye, gazin ji me neke
Te her tişt li xwe serbest kir, li me qedexe neke

Ey mela, heram neke li min sîng û bera
Ji bon wan sînga hezar merî xwe da ber xencera
Ew lêvên wek hingiv heram neke li me
Ewa ku tu heram dikê ji bo me ava zemzem e

Me tîrek avet ji kevana dil ber bi yarê
Ji vî derdî re Loqman Hekîm nedît çarê

Kesê ku şerab nevewartibê di meyxanê de
Kesê ku can nedabê di şerê nefsê de
Kesê ku beden nerizandibê di dergahê de
Bila nekê qîl û qal û fitne û fesadê

Rojî newroz gula biharê, paytextî salî nû
Ji goristanên koletiyê rizgar bûm, dema nû
Agir û pêt im, ba û bahoz im, geş im roja nû
Li asîman baz, li zemîn şêr im, ez im mirovê nû

Corduene, 1ê Nîsanê 2022

# QESÎDEYA EVÎNÊ[2]

Ey Mela, sal bi sal ya le geriyam çiye
Eger ew sir eşq bê, ya dil disotê çi ye?
Ey Feqî, ya mirov dîn û har dike dilber e
Ya dil disotê ne eşq e, tîra firqetê ye

Ey Mela, te çendî xwendiye ji elîf û bê yan
Jehr e an hingive ya dibarê ji lêvan?
Ey Feqî, ilme me ne elîf û bê ye
Her xeta me noqteyek ji eşqê ye

Ey Mela, ji bo bisk û gerdenê yarê
Serxweşim ji eşqa sîng û berê
Hew dizanim çibkim ji derdê dilberê
Dilê min li Turî Sîna digerê

[2] Ev helbest di Kovara Nûbihar hejmara 159an de hatiye weşandin.

Ey Mela, hew dizanim çibkim ji derdê van gerden zêran
Derba eşqê em birîndar kirin ji pê heta seran
Sed mêrên wek Ristem dikin mîna şima
Ji bo Leylayekê me emr borand, ne Leyla hat ne jî emr ma

Ey Mela, ya em dixwenin ji kiteba qudretê ye
Ya em şev û roj vedixwûn şeraba eşqê ye
Meyxanêya sekranbûya war û mekanê me ye
Hembêza qametelîfan cihê şa û aramîya me ye.

Ey Mela, ji derba awirên yarê perîşan im
Ji bo wan xal û zilfan dil bijan im
Di qedaha şerabê de qurtek ava sor im
Li çiyayê qaf sîmurgê windayî ez im.

Ey Feqî, çima naxwênê ji kiteba min
Çi sebebe ku navexwê ji şeraba min
Ey Mela, ya em dixwinin sîng û ber in
Ya em şev û roj jê vedixwin dev û lêv in

Ey Mela, me can da di rêya çavbelekan de
Fitû çiye, tu şerh bike di kitêbê de?
Ey Feqî, eşqa çavan biqasî ronîya findê ye
Ya canfedayan wek ster û rojê ye.

Ey Mela, ilme te xwendiye ji kiteba şerîatê
Eger te negihînê rêya heqîqatê
Tu ji were dergaha xerabatê
Tê bi qurtekê bibînê sir ê heqîqatê

Ey Feqî, ev çiye ku xwîn li me har bûye
Hicrana ji lêvê yarê mîna ar bûye?
Ey Mela, ji meha adar e demsal bihar e
Ew xwîna germ şûnwarê ramûsanên yar e.

Ey Mela, Dilazad im evîn di dil de şax da
Di vê rê de me dil û can da
Can bi can, dil bi dil da
Can jî, dil jî, evîn jî erzan da

14.04.2022

# SÎNG Û BERÊ YARA GERDEN ZÊRÎN[3]

Êy yara naz û narîn
Tu yî xwedan gerden zêrîn
Şev û rojên min her pîroz in
Li ser wan sîng û berên şîrîn

Ber sed milkê tirk û ereb û ecem
Qurbana yek ramusana te bin
Ax û av û zêr û zîvê wan
Qurbana sîng û berê te bin

Sed kral û şah û siltan
Her yek qurbana şopa piyê te bin
Hezar text û tac û qesr
Qurbana awirek te bin

[3] Ev helbest di Kovara Bernamegeh hejmara 7min de hatiye weşandin.

Parîs û london û new york
Qurbana axa li ber piyê te bin
Hemeros û shakespeare û dante
Qurbana wî zimanê te bin

Li ser sînga te heft roja
Her roj heft cara biçêrim
Bi heft ava çemê bunisra xwe bişom
Lê dîsa wek te spî nabim

Dijlê û ferat in sîng û berê te
Ji wan diherikê tê
Ava jîn û jiyanê
Jê têr divexûm lê dîsa tî me

Şeva ku sîng û berê delala min
Dibe bexçê gul û rihana ji bo min
Namênê kul û derdek li min
Dibê temenek ew şew ji bo min

Sîng û berê wê esmerê
Serxweşkir im, awirên wê qeşmerê
Bi zimanê şêrin dil da ber talanê
Wê esmerê wê qeşmerê talan kirim li ser bênderê

Thama lêvê te wek sêvê gihaye
Thama sîngê te wek şaraba sala ya
Şêwqa rûyê te heyva çardeha ye
Çavête reşin wek şeva ye

Jiyan bi te re xweş e
Bê te ev dil nexweş e
Bi te re zivistan bihar e
Bê te havîn jî li min sar e

Ev çil sale ez dikim qîr û hawar
Geriyam diyar bi diyar, war bi war
Min nedît li gor dilê xwe dost û yar
Bi hêvî û xwezîya nehat bihar

Neçin ji enqere û tehran û bexda nepirsin
Herin ji amedê bipirsin
Ji mehabadê bipirsin min
Ewê ji we re bibêjin armancên min

Her cara ez te dibînim
Kul û birînê çil salî bibîrtênim
Sal bi sal xwezî bi par
Nema ew war û ew bihar

Îro ji deftera jiyanê pelekî nû divekim
Li ser bingeha têkçûyî, serfîrazîyan ava dikim
Perdeyên li pêşiya ronîye radikim
Roj diçirûsê nava dilê min, hişekî nû ava dikim

Kurdistan, Nisana 2021

## QESÎDEYA BIHÛŞTÊ[4]

Çi muamaya, çi aşqe, çi belaye ey mela
Têm xepandin bi qedehek û ramûsanekê
Ev lêv, ev sîng, ev gerden çiye ey mela
Her kes bi derd e, kes nîne şerh bikê

Ey zahid ji min neke gazinan
Şîretên te nakevin dilan
Awirên wan dilberan
Hiş nahêlin li seran

Ey mela carek were bi me re meyxanê
Tê bibînê ku her kes bi ilmê te zanê
Tu jî wek me vexwê ji wê şarabê yek tasê
Tê li xwe heram bikê rêya camî û medresê

[4] Ev helbest di Kovara Bernamegeh hejmara 6an de hatiye weşandin. Di kovarê de navê helbestê bi şaşitî wek 'Şev û Mij' hatiye nivîsîn.

Ey saqî bide min şaraba aşqê yek carê
Sermest bibim bi “lam û bê” ye yarê
Ji bo sîng û berê wê dilberê
Sed can didim bi yek nezerê

Ey mela li min neke waz û nasîhatê
Tu dibê heram e, ez dibê ava heyatê
Tu dibê ew yar wek agir e
Ez dibê wek hingiv û şekir e

Dêr ji bo keşa, mizgeft ji bo mela ye
Dergaha min hembêza yarê ye
Her bişkoka ku vedikim li ser pêsîre
Mîna mifteya bihuştê bi xwe ye

Milkê ereb û ecem û tirkan
Li ber fermana te bin ey dilber
Nakim şikayet ji husn û cemala te
Şanika li ser rûye te bim bes e ey dilber

Ey mela her kes bûye mûbtelayê pere
Dîn û îman maye peya li ber pere
Pere bûye bav û dê, insan nebû dilşa
Bêpere nameşê karê mela û keşa

Sed mizgeft nakê meyxaneyek
Sed waz ne bi qedehek
Bedena te “laleşa nûranî” ye
Tewaf dikim rojê carek

Ey saqî, çima nade min qedehek ji ava kewserê
Dil û hinav şewitîn bi vê keserê
Dilazad wek sîmir qaf bi qaf digerê
Çend sal in ne gihiştim mizgeftê ne jî dêrê

Kurdistan, Nîsana 2021e

## DENGVEDANA DERENGMAYÎ[5]

Ez hew dinivîsînim
Ber ew dîroka hilweşandî û tar û mar,
Ew kavilên ku bûne hêlîna kundan,
Ew zimanê ji şîr spîtir ji hingiv şîrîntir
Ku bûye qedexe û hatiye jibîrkirin, çîroka xwe binivîsînê.

Ez hew deydikim
Ber ew jinên ku di temenê bûkaniyê de
Li hember hovên sedsala bîst û yekê de
Bi çekan pareziya namusa xwe dikin, biaxivin.

Êdî ez şerm dikim
Ber ew jinên ku di paşila xwe de
Hêviyan xwedî dikin, bibêjin çîrokên xwe
Ew kaniyên ku ji sîngên wan dizin
Û ber bi azadiya mirovahiyê ve diherikin, xwe bibejin.

[5] Ev helbest di Kovara Nûbihar hejmara 156an de hatiye weşandin.

Êdî ez westiyam
Ber ew jinên ku bi ramûsanên xwe
Zilamên wek kevir nerm dikin
Û bi sîng û berê xwe
Ew zilamên wek qeşayê, dihelînîn,
Dengê xwe li cîhanê belav bikin.

Êdî ezê bêhna xwe berdim
Ber ew zaroyên ku li hember zordariya
Gurên har û devbixwîn
Bi keviran tekoşîna xwe nîşandidin
Û tirsê ji xwe ditirsînin,
Çîroka xwe vebibejin.

Êdî ez nabêjim
Ber ew erdnîgariya ku navê wê hatiye guhertin
Û bi çem û çiya û deştê xwe
Di bin piyê hovên xwînmij de maye
Û bi gund û bajarên xwe ve hatiye bomba barankirin,
Bibejê serpehatiya xweyî têkçûyî.

Êdî ez bêdeng dibim
Ber ew zarokên dipêçekê de
Ku li benda şîr û sînga dayika xwe,
Bûkên jibîrbûyî û desthinekirî,
Xortên ku li benda ramusaneke destgirtiya xwe,
Kalê ku li benda hêviya xwe,
Pîra ku çîroka ji dîwaran re dibêjê,
Dengê xwe bilind bikin.

Bila ew bajarê ku te di hembeza xwe de veşartiye
Ew roya ku bi tîrêjên xwe ramusanên te diyar dikê
Ew barana li ber pîye te
Ku mîna helbesteke bêxwedî dibarê
Ew kenê te yê ji nav kaniya dizê û sînoran derbasdike,
Çîroka min ji te re bibêjê.

Ezê guhdariya te bikim
Tu hemû hevîyên xweyî ku dibin tinebûnê de çilmisîne
Û ew xewn û xeyalên te ku bi sterka hatine xemilandin,
Ew dilê te ku bi ronîye geşbûye,
Çavên te ku awirên serxwebûn û serkeftinê
Li her çar aliye cîhanê belavdike, bibêjê çîroka te.

Ber ew kesên ku azadî tahm nekiribin,
Wateya azadiyê jî tênegiştibin
Û wek koleyekî ku xwe azad dihesibînin û dijîn, çîroka bibêjin

Ber hiş û bîr û têgihiştina mirovên zana
Ku dinav kesên pûç û rizî û zingargirtî de diçilmisê
Û tê hilweşandin, daxwazen xwe bibêjin

Bila ew kesên xwedî nerîn û ramanên pûç
Gund û bajarên pûç
Û li benda roniya li pişt ewran dirawestin, xeyalên xwe bibêjin

Bila ew kesên xwedî aborî û felsefeyeke têkçûyî
Ku armanceke bilind
Ber bi bexçeyê ronahiye ve avadikin, xewna xwe bibejin

Ber bê ew kesên xwedî evîn û malbat û jiyaneke têkçûyî
Serfîraziyên belengaz, hêviyên jibîrkirî
Û daxwazên bihûştê dikin, pêşeroja xwe bibejin

Ezê li bin siya darekê
Ku li serê çiyayên bilind şinhatiye rûnim
Û ezê li benda dengvedanên derengmayî bimînim.

Kurdistan, Nîsana 2021e

# TENÊ GUHDARIYA BÊDENGIYÊ DIKIM[6]

Tenê guhdariya bêdengiyê dikim
Lê di bêdengiye de çiqas qîr û hawaran dibihîzîm
Kes pê nizanê.

Behna bajarekî ji ber teqîna maye tê behvila min
Rê û şopên piyên min dinav li xwegerîneke gûmanwarî de ye
Dîsa jî di hembêza xwe de hêviyên ber bi serkeftinê dimeyenim.

Bi tev hebûna xwe, êş û xemgîniyan li paş xwe dihêlim û ber bi roniyê ve dimeşim
Dimeşim, tevna jiyanê dihûnenim ji bermayînên bêjingê
Di tenûra serfîrazîyê de dipejin armancên min
Bi destên qirêj têne hilweşandin ew şûnwarên bi destê terikî avakirî,
Ez ji bo avakirinê, ji bo armancan dimeşim, diçim.

[6] Ev helbest di kovara Nûbiharê de di hejmara 150î de hatiye weşandin.

Di awirvedanê rojeke nixûmandî de
Ber bi behna bihareke derengmayîn de diçim
Tîrojên ku bedenên zingargirtî ji şevên şikestî rizgardike
Li ber kenê kulîlkên rûgeş
Dîlana çirçirken nûgihaştî
Temaşageha dilê min ê azad ronî dike.

Ewqas dûr nemeyzêne
Di kurahiya dîtinên te de bajarên hilweşandî
Dîrokên talankirî
Mirovên li ber sêdarê dikenin hene.

Di reşahiya şevê de ew çavên te dibûn çira
Ez li ber şopa şewqa te digeriyam.

Ew awirên te ji ber çend fermanan filitîne
Wek tîreke serseri û bê armanç dinava dilê min de kon vedaye

Tu çûyi lê behna te belavbûye li vî bajarî
Bê te tenetî wek baraneke şapeyî dibarê li ser serê min
Lehî serûbin dike xeyalên min
Bitenê, tî, birçî û behnteng im
Dema tu ji vî bajarî çûyî

Di şevbûherkên ji zivistanê mayî
Xewn û xeyalên Dilazad wek çîrokek nîvrê mayî
Li benda biharê me, li hêviya dawiya çîrokê me
Min nizanîbû bihar jî tu yî
Dawiya çîroka min jî tu yî

Batman, Tirmeh 2019

## EY XWEDA

Me alaya mirovahiye bilind kir
Tu nehêle ku dakevê, ey Xweda
Me kelha dadê ava kir
Tu nehêle ku hilweşê, ey Xweda
Me ji dîn û zanîne şûr û mertal çêkirin
Tu şûrên me tûj, mertalên me bihêz bike, ey Xweda
Ev xak, bi namus û rûmetê hatiye avdan
Tu bêrûmet neke, ey Xweda
Ev welat nîşana fermana Te ye
Tu bêferman nehêle, ey Xweda
Ev azadiya ku Te daye me
Da tu kes ji destê me dernexê, ey Xweda
Ev av û çem, ev çiya û zozan
Tu bê mirov nehêle, ey Xweda
Tu biparêze ey Xweda, vê jiyana azad
Ji destê dagirker, mêtînger û sîtembaran

Vê sirûşta ku tenê ji te re secde dike
Tu paqij bihêle, ey Xweda
Ji van bendeyên ku tenê ji Te re serî ditewenê re
Tu temenekî biadan bide, ey Xweda
Ey Xweda, ev xaka Kurdistan e
Warê mazlum û şehîdan e
Li ser rûye cihanê tenê kurd bê dewlet mane
Tu dewleteke serbixwe diyar bike, ey Xweda
Ev ax şûnwarê peyxemberan e, ev mirov neviyên Selahaddîn in
Tu Qudsê nû bi destên wan azad bike, ey Xweda
Her kurdek amadeye ji bo bilindkirina alaya Te
Tu ji alaya kurdan bilind bike, ey Xweda
Ev erd, maka Cudî, Dîjle û Firat e
Ev erd kaniya kurd, siryan, ermen, ereb û farisan e

Ji vê xaka dîrokî zaye, zanist û şaristanî
Tu ji çavnebaran, ji çavbirçiyan biparêze, ey Xweda
Ev can, ev dil, ev hiş wek kaniya zelal û pak in
Tu her dem serfîraz bike, ey Xweda
Ne tirk û ereb û faris im
Ne jî dizanim farisî û erebî û tirkî
Kurdekî serbilid û merxas im
Zimanê min kurdiye, ayetek ji ayetên Te ye, ey Xweda
Dilazad im, dixwazim jiyanek azad û bextewar
Tu me bê azadî nehêle, ey Xweda

## TERTOQÎ[7]

Kaos rût e, bibîne
Li rewşa xwe meyzêne
Çawa jiyaneke tertoqî[8] dijî
Li her tiştî diterpilê û tu dikevê
Dikevê binpiya, bin zemînê, binê dojehê
Pora te spî bûye,
Çermê te reş
Ev çend sale ku te nanê tenûrê nexwariye gelo?
Ev tev kaos te diçilmisênê
An rastiyên jiyana ku nehatiye jiyîn

Ez deqerû me
Bêperde dibejim rastiyê
Bêparzûn direşênim azadiye
Hetîketî nîne ji bo dîna
Ji min re behna sîr û pîvazê wek misk û enberê ye
Ev civakên nexweş
Ev kesayetiyên nexweş
Ji kaosê dizin, ji kaosê diwelidin
Ji can û bedenê xwîn û avik diherikê
Ey mirovên pozbilind
Ji bîr neke ku tu ji dilopek avikî

---

[7] Ev helbest di kovara Nûbiharê de di hejmara 145an de hatiye weşandin.
[8] Tertoqî: Tê wateya tiştê netekûzkirî, nesazkirî, ne tam, nîvrê.

Bêne bîra xwe
Wan laşên li kolanan bêxwedî mayî
Laşên tazî
Ku kuçikan ji goştê van têr dixwar
Pîsîkan ji xwîna wan divexwart
Û hestû li erdê diman
Lê nedihiştin ku zar li ser dayika xwe bigirî
Dayika xwe veşêrê nav axê

Dîsa bênê bîra xwe
Ji bo behnpênekevê bê çawa dayika zarokên xwe
Di cemedankan de dihilandin
Lê nedihiştin ku dayik zarê xwe veşêrê nav axê

Şiyar bibe
Deyl li dora xwe bike
Sterka azadiye geş bike
Ji bêdengîya te diranê min diarê

De bixwûn
Bixwûn heta zike we bibe bermîl
Bixwûn heta hûn bibaecin, heta hûn bifetisin
Hemû xwarinên xweş bixwûn
Bixwûn, jehrê bixwûn, ziqûmê bixwûn
Heta hûn dikarin bixwûn
Cîranên we berbê ji bîrçîbûna bimrê
Ji wer xem nîne
Hûn bixwûn

Dagirin wan kîsa
Wan telîsa
Wan çiwala
Heta hûn dikarin dagirin
Bidewsênin, bizepirênin
Heta çavên we têr bibin
Cîranê we berbê xîzan be
Hûn pera bidin hev
Heta hûn bi wan bicehemin

Hûn pirtûkên pîroz binpê dikin
Gotinên Xweda binpê dikin
Parezgehên dînî dihilweşînin
Natirsin ji Xwedê
Li ser navê Xwedê, mala Xwedê xeradikin
Û hûn dibejin em rizgarger in
Em bendeyên Xweda yên rastî ne
Em hevalbendê Xweda ne
Em li ser rêça Xweda ne
Xweda em ji bo ku we rizgar bikin şiyandiye
Li ser navê Xweda derûyan dikin

Nexape ha, nexape ti carî
Ew dijminên Xweda yên eşkere ne
Wan nas bike
Xwe biparezê ji wan mêjiyên qirej

Adar 2018, Êlîh

## ÇÎROKEK NEJIBÎRBÛYÎ[9]

Dayê, jiyana te bi kul û xema xemilandiye
Ev çiya û ev deşt li ber şopa pîye te ma ne
Di sîtila te de hêvîyên jiyanê hatine dotin
Ji xeftanê te qozeqeran ava dikim
Tu bûye bêrivana kerîye pez, bûye strana dengbêja
Di bilûra şivanan de awaza te
Di dergûşa nûxuriye malê de lorîna te dengvedide
Daye, tu mîna welatê min î
Çavên te çem û rûbar û asîmanên axa pîroz
Di ramusanên te de hêvîya zarokên bindest heye
Navê te çîrokek nejibîr bûye di mêjiyê min de
Dixwenim, dinîvîsenim te
Te, ji zarokên dipêçêkê de rê dibejim

[9] Ev helbest di Kovara Çandname hejmara 6an de hatiye weşandin.

Çendî ku bi salane di zîndanê kor de dijîm
Dema ku bayê felekê
Bêhnekê ji axa ku te pêlêkiriye biber min ve dişiyênê
Ez serxweş dibim dinav çar diwaran de
Çar dîwar bi gûl û kûlîlkan dibe bihar li min
Dema ku ez dibe welat tu tê bîra min daye
Dema ku ez dibe dayê welat tê bîra min
Hêvîyên ku bi azadiyê hatine meyandin
Behna nanê tenûra te difûrê li ser sînoran
Sînor parçe parçe dibin, dîwarên zîndanê parçe parçe
Ronahiyek diçirûse dilê min, dilê min şa dibe
Ji bîr nabe, ji bîr nakim, nadim ji bîr kirin
Ev ax bi ber e, dendikê ku tê de hatine çandin
Yek bi hezarî dide, hezar bi milyonan
Ê dî netirse daye, ez natirsim
Ew azadiya ku me çandiye emê biçinin
Di bin siya alayên kamraniye de.

# HINGIV BI EVÎN DIBE KANIYA ŞÊRÎN

Evîn
Karekî giran e
Karê mêran e
Ji nexweşan re derman
Ji rehetan re jan
Bi evîn dijîn mirov
Bi evîn ronî didin stêr
Bi evîn dizivirin cîhan û heyv û roj
Û dendikê atomê
Bi evîn diherike
Şîrê zaroka nûçêbûyî
Hingiv bi evîn dibe kaniya şîrîn
Hemû hebûn
Bi evîn dikevin zikrê
Kulîlk bi evîn vedibin
Baz bi evîn difirin
Bi agirê evînê ye
Nimêj û sema
Semah û govend

## BES E EV XEWNÊN TARÎ

Ey şeva ku bi hêstiran tê meyandin
Bes e ev xewnên tarî
Ey roja ku perdan li ser birînê me hiltînê
Carek dî me veşêre di pêsîra xwe de
Ey bayê felekê dengê min bigihîne
Gund û bajar û newal û deştê me
Rûkê mirovên di xew de maç bike
Hembêz bike xort û kal û zarên li benda min
De were ey azadiya ku ji bo te
Bi hezaran can bûne feda
De were ey serfiraziya ku roj bi roj
Di dilê min de teng dibe
Ey guhdarê dilşewatiya min
Çûkan nûçeyên birînxedar anîne guhên min
Mîna şêr ketime qafesên zingargirtî
Dest û bazên kelepçekirî ranabin ji bo rizgariyê
Hatiye tewandin stûyê min
Ne ji birînên gûle û bombeyan
Ji xayîntiya heval û hogiran e

# BERÎVANA MIN

Heylê lê lê...........
Pezême bê bêrî maye heylê lê........
Heyfa bêrîvana min ku îro ketiye deste biyanîyan
Berxik û kehrik bê şîr mane
Di gûhanê mîh û bizina de şîr nemane
Şev û roj bi bilûrê dilorînim
Lê îro çiya bê bilûr mane
Ez bê bêrîvan mame heylê lê...........
Ax bêrîvanê, dermane kul û derda ye
Ax bêrîvanê, dew di meşka min de nema ye
Tû dizanê dile min li ser te heye
Ji bo te bû ewqas kişandina jan û êşa ye
Lê îro ez bûme xerîbê bêrîvana xwe ye
Lawike biyan çi zanê qîmete çaven rêşî belek
Çi zanê tahma levên hingivkirî
Çi zanê qîymete wan destê ji şîr sipîtirî
Heyfe ku keçemêr dikeve deste nezanaye
Heyfe ku durr û mircan
Dikevê nav hesine zingargirtîye
Ku hêyva çardeha bikevê paşila tarîtîyê
De heylê .. Lê............ Bêrîvana min lê...

21.05.2005

# BEJN Û BALA TE

Te yê kirasê xwe li xwebikê
Bejna xwe bi durr û mercana bi xemilênê
Porîka xwe bi şehê zîv bişkinê
Kembera zêrîn li bejna xwe bipêçînê
Gerdenîya Merdînê li gerdena xwe ve bikê
Wan çavên xweyî belek bi kilbikê
Hedî hedî te yê xwe berdê serê kanîyê
Tû ye cêrê xwe ji ava spî dagirê
Ger ez dereng bimînim tê li benda min bisekinê
Çaven xwe li min bigerînê
Ezê ji nav mala derkevim
Berê xwe bidim zozanê gundê me
Tû şerm nekê, li min meyzebike
Da carekê bi çavê rojê bibînim bejn û bala te
Da bibînim van çavên te yî mêrkuj.

04.01.2008

# FELSEFEYA KÛR

Li ser bingehên rizî şîroveyên nû na be
Li ser cilên pînekirî pîne na be

Li ser ramanên teng felsefa kûr ava na be
Ji hişê tevngirtî rêber derna ye

Aqil di ser aqil re heye, ji bo vêna aqil divê
Li kesê çav miçkirî re ronî nadivê

Aqil taca zêrînê, lê li serê her kesî nîne
Kesê li pey rastiye her dem tî ne

03.01.2010

## KEVOK

Kevok, kevoka min
Li benda min be
Neçe welatê xerîbiyê
Bi çavên girî xatir ji min nexwaze
Ez nabejim ‘oxir be’ nikarim bêjim

Bimêne kevoka min
Her çiqas ziwa bê axa min
Her çiqas reş bûbe asîmanê min
Û hişk bûbe darên ku bi destê te hatine çandin
Dilekî min heye paqij
Dilekî ku nehatiye dagirkirin
Firîna li çiyayên min ê azad
Xweştire ji qafesên zêrîn

Kevok, kevoka min
Xerîbi kor e, xerîbî zor zahmet e
Buxçika xwe deyne
Bejna xwe bi xemlîne bi kiras û xeftanan
Bi gerdeniya bûkanî gerdena xwe biparêze
Kevok, kevoka min
Neçe, min bê xwe nehêle

## KU EZ VEGERIM YÊ ÇI BIGUHERÊ?

Tu dibêje ‘ku ez vegerim yê çi biguherê?’
Tu were yê baran bibare
Ku baran barî yê bihar bê
Piştî biharê yê azad bibê welatê min

Tu were zîndana diyarbekir
Bibê bexçê gul û kulîlkan
Ne hewara şkenceyan
Yê dengê stranên evîni bilind bibin

# EY SAQÎ TU DAGIR QADEHA MIN

Slavên germ ji tere ey saqî

Ne bi dilêkî bi sed dilî merhaba

Merhaba ji civata meyxanê re

Ji dost û heval û hogira re

Ey meyfiroş

Ne bêje min ‘nevexwe ji ava sor,

Tê serxweşbibê ger tu vexwê qurtekê’

Heyfe ku tu vê şîretê dikê li min

Ez nexweş im,

Ji min re tû yî derman

Ger ez venexwim her roj ji ava sor

Ya bêhn gul û reyhan

Vê demê serxweşim

Serxweş û sekranim

Bêkes û bênasim

Dilopek şarava te nadim bi milkê dinye

Li min qedexe neke meyxanê
Bawer ke ji min
Rêya meyxanê çetir dizanim ji ya malê

Ey saqî tu dagir qadeha min
Da vala nebê tu car ji kerema xwe
Tenê tu nehêle ku valabibê qedeha min
Ji ava bi rengê xwînê

Werê li ba min runê meyfiroş
Ezê ji te re bikim çend gotina
Dirêj bê min bibexşîne
Kin bê bigre ji xwe re jê hikmetê
Were rûne û guhdarbe ji nalînên min
Ji bo meydana hişmendîyê
Ji Adem destpêdikim

Xweda ji herîye beden da Adem
Ji nefesa xwe can da
Ê dî herîya kerr û kor û lal
Bu insan
İnsan hat afirandin ji bo imtihan
Tev ferîşteyan secde kirin bi fermana Xweda
Tenê şeytan zimandirejî kir
Xwe mezintir dît ji cewhera axê
Got ‘ez ji agirim, ew ji axê
Ez mezinim ew binketîye’
Bi van gotina şeytan hat lanetkirin
Adem hat hilbijartin

Tenêtî bi tenê ya Xwedê
Xweda da Adem Hawa
Bi vî awayî mirov xilasbu ji tenêtîye
Bêkesî dijwar e hem bê wate ye

Gelî guhdarên gulav vexwar
Çi sosretîye ku mirov di behiştê de hate xepandin
Li ser daxwaza nefsa xwe hate qewirandin
Bi feneke piçuk ji dest çû behişt
Rehetî çû hat zahmetî
Beleşî çû hat ked
Xweşî çu hat nexweşî

Zarên Adem yek bi yek zêdebun
Navdarên wa bûn Habîl û Qabîl
Habîl nîşana qencî û başîye bû
Qabîl nîşana neqencî û nebaşîye bû
Di dawîye de Habîl hat kuştin bi destê Qabîl
Xwîna yekem bu rijîya li ser axa dinyê
Roj ew roj hê ne rawestîya ye ew xwîn

Çibkim ji bextê dinya yê
Bira, bira dikujê

Dem derbasbûn li ser rûye erdê
Mirov xerab bû yek car
Nuh hat ji bo rastîyê
Lê guhdarî wî kêm û hindik bûn
Mîna kesên li vê civatê
Fermana keştîye hat
Gel pê kenîyan
Ê pê kenîyan roja tofanê gelekî girîyan
Lê girîyê roja dawî bêfede ye
Xerîbe, kurê Nuh ê ji xwe bawer xeniqîye
Xilasnebûye ji bo ku kurê nebî ye

Ey hevalên min ê bi min re divexwin
Hûn dizanin bi çîroka Lut
Qewme wî qewmekî bênamus
Qewmekî bêrumet
Bi ti avê nedihate şuştin ew gunehê wa
Tenê cezayê Xwedê ew bêbinyatkirin
Bi dengekî çûne helakê
Lê jina Lut jî ji kesên windakarbû

Ya Rebb ev çi muamma ye
Lut nikarê jina xwe
Nuh nikarê kurê xwe bênê ser reya rast

Ey civata bijarte
Ne bi guhkî bi sed guhî li min guhdarbin
Agirê ku karê wî şewate
Na şewitênê Birhîm
Brahîmê ku şikestvanê puta
Agir lê tê silametê
Ê ku Brahîm naşewiînê ne agire
Xweda ye, lê agir li ser perdeye

Ne tenê ê tî li avê digerê
Av jî li ê tî digerê
Smaîl temen piçuk
Jê re tê kanîya zemzemê
Sara beyhudê digerê

Yaqûbê bi hesreta Ûsiv kor dibê
Bi behna kirasekî çav ronî dibê

Ûsivê di bazara koleyan de hatîya firotin
Dibê serokê Misrê

Musayê ku xwedî kopale
Li hember ejderhaya biserket
Bi vî kopalî derya bu du qet
Bawermend rizgarbûn
Ê dî binavbûn
Musayê çûye Turî Sîna
Xweda dayê deh ferman

Silemanê ku zanîbu zimanê çûka
Xweda dabu bin fermana wî ba

Eyûbê beden bi kurm
Bi hedanê hat dermankirin

Ûnisê di tengasîyê de
Di ûrê masî de xilasbu

Îsayê di pêçekede axivî
Matkirin mirovê ji rêderketî

Û Muhemmed
Ê ku bi nişana tilîyê wî heyv bu du qet

Ev tev mucîzene
Ne ku karê wan kesane
Qasid mirov in ne ku ferîştene
Ne ku hîlebaz û sehrbazin
Bi destura Xweda bihêzin

Ne pêwiste direjkim
Ji bo hişmenda ta bi derzîyevekim
Ji bo ibretê min bi bîr anin

Avabûn bi hezaran şaristanî
Yek bi yek hilweşîyan ji nezanî
Kanî Înqa û Maya û Aztek
Kanî Sumer û Med û Babîlî
Kanî Misra Kevin û Hînd û Çîna Kevin
Kanî Roma û Selçuk û Osmanî

Bi hezaran fermandar fermandikir
Îro nifira dikin li ê zalim
Mal avayî dikin ji bo ê dadperwer
Ê mîna Cengizê zordarin
Û ê mîna Selahaddînê mafdarin
Tev şer û pevçûnên dinavbera baş û nebaşan
Zalim û mafdaran
Bi dawî nabin heta roja qiyametê

# DEMSALA PIRPIRÎNKÊN AZADIYÊ

Bûm pirpirînk digerim li azadiya xwe
Ne şeva min wek şevê ye
Ne roja min wek rojê ye
Bi hêvî û xebatê digerim
Di nav tariyan de li ronahiyê

Ji reşayiyan ber bi ronahiyê ve
Mîna pirpirînkekê difirim ber bi azadiyê ve
Dilazad im di demsalên hêvîşikestî de
Hêviyan avadikim yek bi yek
Ji têkçûyinan ber bi serfiraziyan ve
Êdî alaya serkeftinê dihejînim
Li ser asîmanên bilind
Alaya azadiyê diçikînim
Li ser çiyayê herî bilind
Û bayê azadiyê
Dil û can û laşê min yên birindar dermandike

Ez azad im êdî
Ez dilazad im
Ji nû ve bi tahm dibe her tişt li min
Evîn
Azadî
Bazdan
Razan
Xwarin, vexwarin
Ken û girî
Şev û roj
Sterk, çem, av, gul
Û pirpirînk

2017

## DU ÇEM BÛN YEK...

Dilazad im, winda bûm di deryaya evînê de
Qedexe ye nivîsandina helbestê ji vir pê de
Evîn noqteyek bû min dirêj kir gelek
Di deryayê de du çem bûn yek...